Evro mezintirîn asteng dikevin rêka bere û pêşvebirina herêma Kurdistanê, ew tirk paşveman bajarê Kerkûkê ye û dijminên kurdan baş dizanin ev şare şarekê kurdiye û hemû rastiyên mêjûyî û cografî diselmîne ku ev bajar kurdî bûye û belge bo vê yekê ewe ku Kerkûk di çerxê 19-ê de paytextê mîrnişîna Şehrezûr bû.

Di dirêjiya dîrokê de ev bajar, bûye cihê nakokiyê di navbera hikûmeta Îraqê û bizava rizgarîxwaza kurdî de, heger bi hûrkarî bas li vê dozê bikin dê çend rastiyek bo me bihêne diyarkirin: li 11Adara 1970-ê rêkevtinek di navbera hikûmeta Bexda û bizava rizgarîxwaza kurdî de peyda bû, yek ji xalên vê rêkevtinê ew bû ku amar bihê kirin li ser neteweyên akinciyên Kerkûkê. Kurd bi vê yekê çavron bûn û nîmçe omêdek li cem peyda bû ji ber ku di wê baweriyê de bûn ku piraniya akinciyên vî bajarî kurd in. Pilan bo hate danan ku sala 1977-ê ev amare bihê kirin, lê mixabin rêkevtina sala 1970-ê hate ji navbirin, bi taybet paş Barzaniyê nemir biryar dayî û gotî: kurdan maf di petrola Kerkûkê de heye lê hikûmeta Bexda ew yek bi bangewaza şerî li qelem da û bû eger ku hikûmeta Bexda biryara otonomî bi yeklayenî bide bêrazîbûna kurdan û armanc jê sistkirina bizava şoreşa kurdî bû û paşan her ew hikûmet rabû bi çend kar û raperandinên kargêrî bi şêweyekî gîştî weku guherîna sinorê vî bajarî bi awayekî ku pitir xelkê ereb ber bikevin û her wesa

Petrola yedeka Kerkûkê digehe 10 milyar bermîlan

Hişyar Silêvanî

navê Kerkûkê jî kire Temîm û rabû bi veguhastina ereban ji başûrê Îraqê bo nav vî bajarî û rabû bi padaştkirina wan bi zevî û pereyekî baş, ev kare bi rengekî nexşeyî û rêxistî berdewam hate encamdan.

Ev kiryare li berçav dijminên gelê kurd, ron û aşkereye, bi tenê tirsa wan ewe, heger Kerkûk vegere ser herêma Kurdistanê şiyanên ragehandina dewleta kurdî peyda dibe.

Ji layê aborî ve, vî bajarî giringiya xwe heye. Da ku em bizanin giringiya vî bajarî li çi redeye, pêdiviye em bizanin ku dihête jimartin yek ji bingehên serekî yên berhemên petrolê li Kurdistana Îraqê, gelek ol û netewe lê dijîn, wek: Kurd, ereb, tirkman, aşûr, kildan, ermen. Ev bajar 250km ji bakurî rojhelat Bexdayê dûr e, ji layê bakur ve, Hewlêr û ji layê rojava ve rûbarê Zapê biçûk e û ji layê başûr ve zincîra çiyayê Hemrîn e û rûbarê Sîrwan e. Jimara akinciyên Kerkûkê li dû amara sala 2003-ê 755,550 kes in.

Zarê biçûk nêzîk 45km ji senterê bajarî dûr e projeyekê mezin yê avdanê li ser wî rûbarî hatiye çêkirin û avê digehîne bajarê kerkûkê û zeviyên derdoran. Rawêjkarên petrolê weha didin xuyakirin ku qewerya petrola yedeka Kerkûkê digehe 10 milyar bermîlan û şiyanên berhemînana 750 hezar bermîlan rojane heye. Yek ji egerên berdewambûna gefên Turkiya bo ser axa Kurdistanê ew e ku ditirsin Kurdistana Îraqê hemû bibe yek parçe û dirametê aborî di destê kurdan de fereham bibe û bibe hander ji bo xurtkirina bizava rizgarîxwaza di nav axa Turkiyê de û daxwaza cudabûnê ji Turkiyê bihête kirin.

Her ji sala2003-ê ta niho jimareyek karên têrorîstî li vî bajarî hatine rûdan, bi taybet li ser hêlên boriyên petrolê ew ku petrolê digehîne derya navîn ku bûye egerên gihandina ziyanên mezin bi milyar dolarên Emrîkî.

Bîrên petrolê:

1-Babagugur
2-Bîra Çembûr
3-Bayê Hesen
4-Bayê Hesena bakur
5-Baba Şor
6-Bîra Avan
7-Bîra Xebaz
8-Bîra Çiyayê Bor
9-Bîra Xirmale

Taxên kurdan;

1-Şorce
2-Rehîmawe
3-Tebe
4-Îskan
5-Îmam Qasim
6-Azadî
7-Taxên mayên jî sê pişkên wan kurd in,

Berî ku hikûmet bi karê guherînê rabe, rêjeya kurdan 80% bû û 20% yên dî bûn.